


Qasimlo: fîlozofek jîr û parêzvanek cesûr

Ger em felsefeya Platon (Eflatûn) bo şirove û raveya kesayetiya dr. Qasimlo bikar bînin, ew yek dikare alavên pêdivî bow î karê giran bêxe ber destan û ciyê laîqê wî di cikava Kurdistanê de destnîşan bike.

dom»R:4



Dr. Qasimlo jiyanekî zelal û pak bihorand

Rayedar û dîplomatê Kurd, Dr. Abdurehman Qasimlo roja 22.12.1930'yan di "Şeva Yelda" de, li Derîyê Qasimlo, li teniştê qeleya Dimdim a li Urmîyê hatîye dinyayê.

"Şeva Yelda" yani bi gotina Kurda "Çile" di raza efsaneya Zerdeşt te, "Yelda" bi wateya "Ji nû ve Zaîn" e. Ev şev, şeva herî dirêj a salê ye. Duktur Qasimlo di rojêke pîroz de, wek xelateke Yezdan hatîye dinyayê. Ew keremeke mezin e ji bo hemu Kurdan.

dom» R:5



Tehran bû Kurdistan, guhertin tê

Di bizava Jin, Jiyan, Azadî de sloganek li kolanên Tehranê hat bilindkirin ku ji bo gelek kesan têgihîştina wê zehmet bû, lê ev silogan di hîlbijartinên sala 1403'an a Rojî de cih girt û Tehran li hember rejîma desthilatdar a Îranê bû Kurdistan.

Silogana "Bila Tehran bibe Kurdistan, Îranê bibe Golistan" li gel "Bimre dîktator" siloganên stratejîk bûn ku ji aliyê xwepêşanderan ve di dema tevgera Jînayê de li kolanên Tehranê hatin avêtin.

dom» R:6



Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (473) 06-07-2024 Buha (1000) Tûmen

Sîmaya Dêموكرات, dilequtk û nîgeraniya rêberêk



N. Kerîm Perwîzî

Xala herî girînge kesayetiya rêberêkî siyasî yan heçî rêberêkî li warên dinê de, eve ku mirov bi xatircemî ji hundirê wî bi wateyekî din bi erxayînî wî guhdarî dikin û xeberê wî dikin û ev rêbere jî mirovên derdora xwe wekî mirov dibîne, neînkû wekî pirebask wan bibîne.

Rêber li xebata neteweyekê de, dengekî hundiriye ku kite kes li hundirê xwe de dibihîsin li hizr û raman û gotina wan de deng vedide. Her lewmaye ku rêberê netewî li ser bîngeha bandora dîrokiyî peyvan hildibijêre û bi sehkîrin bi berpirsayeriya li henber peyvan tîne ser zar û zimanan. Peyv li cem rêberê siyasî yê xebatekî pir ji gernasîya neteweyekê, dengekî demkî û hestekî kêmnî, belku derwestbûne li henber zeman û pêşerojê jî, lewma li hizra giştî de dimîne û gotinên wî dibne rêbaz û risaya xebata çendîn nîfşên piştî wî jî.

Duktur Qasimlo çi wekî rêberêkî siyasî ku diba siyasta şorişekê dabirêje û çi wekî rêberêkî netewa xw dibû rabûna netewa xwe ya bêpar ji niştîmanekî azad ve girê bide û hîvya lê xwedîderkevîna ji niştîman di nava wan de bihêz bike, diaxivî û kar dikir û hizra xwe di nava civatgehê de belav dikir.

Jibîlî wan rehendan jî, Dr. Qasimlo aliyê kite kesî û rabûn û rûniştina microvan piştguh nedêxist û li dilequtkên wî de berdewam xuya dibû û tîna ser ziman û digot ku em çi wek netewe xebatekî giran li pêşya meye û çi wek kite kes erkê rojane û kiryarên dem bi demê me li ber çavê kamêrayên dîrokê û nîfşa piştî meye ku bizanin em çi bo wan bi mîrat dihêlin.

Dema ku wî base nîfşên cudaye nava şorişê de dikir, digot erkê nîfşa yêkim a xebatê ewa bûye û wiha kirine, û erkê nîfşa duyem wiha bû û xwe nîfşa sêyem a nava şorişê dizanî û erkên nîfşa sêyem bas dikirin û digot: Em dive erkê xwe bigehînine cî heta ku nîfşa piştî me şehîd çinebin. Ewa dilqutke û nîgeraniyekî mezin bû cem Dr. Qasimlo yê nemir ku bexteweriya paşerojê girê dida bi riftara îroye kite kesan.

Renge geryana bi du wan riste û peyvên pirwate û diyarîkerên rêbaza jiyanê de gelek dijvar be û karekî giran bête ber çav, lêbelê di yêk ji belgên girîng de Dr. Qasimlo yê nemir rêze dilequtk û nîgeraniya xwe tomar kirine ku bi wan ve kite kesekî xebatkarê xwedî hizr û helwêst têtê naskirin.



22ê Pûşperê

Bawerîhebûna bi xwe, û piştqahîmiya bi civatên xelkê Kurdistanê ji taybetmendiyên herî berçav ên Dr. Qasimlo bûn

Rêbaza Qasimlo, rênîşanderê hemû biyavên xebatê

Dêموكرات ji girêdayî bûnê vîzare, Dêموكرات alîgirê azadî û dêموكرasiyê ye, Dêموكرat dijî heçî cure zilmeke ye li ser microvan, Dêموكرat alîgirê vekheviya tevave di navbera jin û mêrane, Dêموكرat mirovdoste.....

Ewane hindêk ji wan xalane ne ku Dr. Qasimlo li gotara binavûdenge bi nave "Sîmaya Dêموكرat" de xistine ber bas.

Dema ku base sîmaya dêموكرat dike, di rastî de base wî mirovê xwedî helwêst dike ku li kuncê dem û cih de ser pê yê xwe rawestiya ye û barekî girane "sîzîf" asayî li ser mila ye û bi berewajiyê efsaneyan, ev mirovê xwedî îrade neînkû rastî şikestê nayê, belku bi kiryarên xwe jiyanekî nû diafirîne.


Yêk ji rehendan sîmaya dêموكرat ku Dr. Qasimlo dixwaze bike olgû û cihê lêfêrbûnê, pêkhatiye ji hevsengîya azadî û wekheviyê bal mirovekê ku bi dêموكرat têtê pênasekirin. Dr. Qasimlo dibêje: azadî nîrx û kerametê dide mirov û hevdem dibêje: wekhevî wê kerametê diparêze û şorişvan bûna bi dijî şikana wê kerametê qurs û qahîm dike.

Ewa ku li cem Dr. Qasimloyê rêber girîng û cihê dilequtka rojaneye wî bû, ewa bû ku çi cure mirovek û di rastî de çi cure kiryarêkê dike serbaşqe û evê ku dibêjin li rêbaza Qasimlo de pênga- van dihavêjin, xwediyê çi sîmayekê ne. Dêموكرatbûn bal Dr. Qasimlo tenê navek û hizbekî siyasî nine, belku erkê rojane ye ku girê dide bi erkên niştîmanî û rabûna civatgehekî xwedî helwêst de cih digre û bi giştî sîmaya dêموكرat ev berçaviya û naverokê ku azadî û bexteweriyê hem dike rengrêja îro û hem dike diyarî bo nîfşa paşerojê.



Serokkomarê lat û lûtan, serokkomarê neteweyên mafxwarî nîn e!

dom» R:7



Derxistina hîcabê, an jî hicaba bizorê

dom» R:8

Navenda Birêveberiya Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê Îranê: Serkevtina baykota binav hîlbijartina 8ê Pûşperê, rêfrandomek dinê bû li dijê komara Îslamî

Civatên mafxwazê Îranê!

Xelkê xebatkarê Kurdistanê!

Welat û Rêxistin û Cîvatgeha cîhanî!

Rêjîma Îslamiya Îranê li roja Înê 8ê Pûşperê, binav hîlbijartineke pêşwext a serkomariyê bi rê ve bir. Ew binav hîlbijartina li demekê de hate kirin ku civatên xelkê Îranê li nûtirîn hîlbijartina rêjîmê bo meclîsa xubrêgan a rêberî û meclîsa şêwra Îslamî li 11ê meha Reşema derbasbûyî de “Ne” yeke mezin gotne rêjîma Îslamiya Îranê. Rjîma Îslamiya Îranê wa dihesiband ku ew rewşa siyasiya taybet ku piştî kuştina “Reîsî” li navxwe û derve çê bibû û herwisa bi endazyariyeke nû li destnîşankirina moreyên xwe bo xapandina xelkê û gerimkirina bazara hîlbijartina xwe bi kar bîne û asta beşdariya xelkê zêdetir bike û bi vê yekê, rewatiyekê bo xwe li asta navnetewî de bi dest bîne.

Anîna bi nav rêformxwazan bo nava wê leyîzê û hewldan bo dualêkirina hîlbijartinan, taktîkeke din a rêjîmê bo handan û bizvandina xelkê, bi armanca zêdekirina asta beşdarîkirina xelkê bû. Herwisa rêdan bi berbijêran li çarçoveyê kontrolkirî de bo anîna ber basêye hinek mijarên hestiyar û birna jêr pirsyarêye kar û karnameya hev bo evê ku vê carê jî armancên rêjîmê bi rêya hîlbijartina aliyê kêma “xirab” li hember “xirabtir” ji aliyê xelkê ve bê kirin. Lê helwîsta civakê û reftara siyasiya xelkê Îranê, nexşe û pîlanên rêjîma Îslamî pûç kirin.

Her pêka encamên fermî ku hatne ragihandin ku ji aliyê piraniya çavdêrên siyasî ve bi çavê şik û gumanê tête mêzekirin û bi hizra wan destêverdan hatiye kirin, asta beşdariya xelkê kêmtir ji %40 bûye, bi vê wateyê ku sartirîn hîlbijartina li hemû dîroka rêjîma Îslamiya Îranê û sartir ji hîlbijartina doreya sêzdehem e ku “Îbrahîm Reîsî” bi rikeberî digel dengê şewitî de navê wî ji sendûqan hate derxistin. Ev yeka jî encama



têgihîştina siyasiya xelkê Îranê û geşeya tevgera mafxwazaneya gelên Îranê ye.

Dema ku Elî Xawmineyî bi lahîkirinê xelk gazî dikire bo ser sendûqan û digot ku nabe bo karekê ku ne zehmetî heye û ne ti nirxekê didin, dudil bin, çimkî her dengeke we sitûnek bo ragirtina vê nizamê ye, Xelkê jî bê dudilî û bi bawerî bi rastiya helwîsta xwe, “Ne” gotne rêberê rêjîmê û bo vê ku bibêjin her dengek ku bo sendûqê nehatiye avêtin, dengê dijber û li hemberî rêjîma Îslamî ye.

Serkevtina baykotkirina binav hîlbijartina serkomariyê, daye xuya ku xelkê Îranê êdî amade nîne bi hîlbijartina li navbera “xirab” û “xirabtir” qedera jiyan û paşeroja xwe bispêre destê rêjîmê, vê yekê da xuya ku ne bi sozên çewt û xap-andinê, dilxweş dibin û ne dengê xwe dikin alava destê rêjîma Îslamî bo bi destveanîna rewatiya vê ya nemayî. Baykotkirina berfireh a hîlbijartinan, şêwaza rifrandomeke eşkere li dijî rêjîma Îslamî û zêdetir ji 4 dehikên kuştin, cinayet, girtin û bidarvekirin, gendelî û destbiserdagirtina sistematîk a maf û azadiyan ji aliyê desthilat rêjîmê bû.

Baykotkirina hîlbijartina 8ê Pûşperê, berdeamiya gotina “Ne” bi rêjîmê ya hîlbijartina 11ê Reşemeya sala derbasbûyî bû û hevdem çirîskîna tevgera “Jîna” bi dirûşma “Jin Jiyan Azaî”yê û berdeamiya xebat û berxwedaniya xelkê Îranê bo derbasbûn ji rêjîma Îslamî bû. Niha jî hewlên rêjîmê li gera yekem de şikest xwariye, li benda gera duyem û Îna bê ye ku bi rêya nîşandana çewt a rikeberiya du nêrîn û hizrên dij bi hev bo handana xelkê, her wek Xamineyî îtiraf kiribû, abrû û hetikekê bo mana rêjîmê bi dest ve bînin.

Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê Îranê tevî pîrozkirina serkevtina baykotkirinê û îradeya hemû gelên Îranê bi taybet gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ku kêmtirîn rêjeya beşdarîkirinê tê de hate tomarkirin, daxwaza berdeamiya vê xebat û xwêragiriyê li gera duyem a vê hîlbijartinê de jî dike. Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê Îranê her li vê çarçoveyê de jî rola karlêker a Hizba Dêmkokrat û rêxistinên siyasî, jinan û ciwanan, bijartiyên siyasî, rewşenbîrî û olî, ragihandin û rêxiravên civaka medenî li serêxistina helwîsata baykotkirin û tomarkirina vê serkevtinê bi ser rêjîmê, bi bilind dinirxîne.

Ji dîtingeha Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê Îranê ve, encama vê binav hîlbijartina nû ya rêjîma Îslamiya Îranê, hilgirê peyamekê jî bo welatan û civaka cîhanî ye ku ew rêjîma şerxwaz û çêkerê qeyranan ku aramî û asayîşa deverê aloz kiriye, li navxweyê Îranê de bi çî qasekê li hember îradeya xelkê de zelûl e û desthilata vê heta çî astekê herifî û hilveşiyayî ye, lewma welat û civaka navnetewî, hewce ye ku dengê tevgera mafxwazaneya xelkê Îranê bo derbasbûn ji rêjîma Îslamî bibîzîn û bo encamdana cinayetên û tepeserkirina zêdetir a tevgera nerizayetî, derfetê nedne rêjîma Îslamiya Îranê. Hizba Dêmkokrat hevdem serkevtina baykotkirina vê carê jî bi destkevtê girîng bo yekîti û hevxeberiya aliyên siyasî û pêkhatyên Îranê bo girîngîdan bi xebat û tekoşîna hemû alî û çendîn alî li dijî rêjîma Îslamiya Îranê û serkevtin bi ser vê rêjîmê dizane.

Navenda Birêveberiya Hizba Dêmkokrat a Kurdistanê Îranê

30ê Hezîrana 2024 a Zayînî

Mistefa Hicrî: “Xelkê Îranê, hîlbijartinan baykot dîkin û tî rewatiyekê nadne komara Îslamî”

Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê li hevpeyvinê de digel “Kurd Kanal”ê, ragihand: “Hilbijartinên pêşwexte ya serkomariyê li Îranê, li rewşekê de bi rêdîçe ku Îran bi sedema siyasîyên komara Îslamî li nav qeyranên cûrbicûr ên siyasî, aborî û civakî de nuqim bûye.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizbê ragihand ku ji mêtve rastî bo xelkê Îranê eşkere bûne ku binav hîlbijartinên li Îranê ne tenê îradeya giştîya xelkê bo guherîn li rêjîma siyasî û îdarî ya welat de nîne, belku çêkirina senaryo bo anînaserkar a kesek ji nav çend moreyên destnîşankirî yên rêjîmê li sendûqên dengdanê ye. Rêzdar Mistefa Hicrî ragihand ku encama hîlbijartinên dora Sêz-

dehem a serkomariya “Reîsî de bi kêmtirîn dangan û beşdariya xelkê hate diyarîkirin, tevgera “Jîna”yê û encama hîlbijartinên 11ê Reşemeya sala derbasbûyî bo meclîsa xubregana rêberî, cihê şik û gumanê bo ti kesê nehişt ku xelkê Îranê ti baweriyek bi vê rêjîmê nînin û desthilata komara Îslamî bi tevavî red dîkin.

Rêzdar Mistefa Hicrî got: 6 bijarti-yên niha bo kêbirkêya hîlbijartin a serkomariyê, hemû moreyên serekî yên rêjîmê li dehan salên derbasbûyî de ne. Ew bi xwe sedema bingeîn a vê rewş û qey-rane ne ku bi ser xelkê de hatiye, Lewma xelk hişartir ji vê yekê ne ku bi banghêjî û sozdanên wan, bêne xapandin, lewma wan hîlbijartinan baykot dîkin.

Kak Mistefa her wisa got: “Pizîşkiyan navesêrê ku bi tenê



bo zêdekirina asta beşdariya xelkê bo dengdanê hatiye meydanê û gotiye ku li her rewşekê de guh bi fermana Xamineyî ye û ti bernameyêke taybet jî wek bernameya dewleta xwe nîne û li bingeîn de nikare ti bernameyêke hebe, çimkî desthilata tevav a îdarekirina welat li ciheke din û ji aliyê wilayeta feqîhê ye, lê xelkê Îranê bi têgihîştina siyasîya xwe îzîne nadne rêjîmê ku beşdariya wan wek kartek bo rewatiyên bi rêjîma siyasîya welat li pîrsgirêkên deverî û cihanî de bi kar bîne, lewma hîlbijartin û çon bo ser sendûqên dengdanê baykot dîkin.

Mistefa Hicrî: “Xelkê Kurdistanê wek serekîtirîn xisarberketiyê terorîzma spaha pasdaran, piştevanî li biryara Kanadayê dîkin” tawanên mezin, Hemîd Nûrî, daxuyaniyek belav kir

Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê li derheq bi terorîstnasîna spaha pasdaran ji aliyê dewleta Kanadayê ve ragihand ku xelkê Kurdistanê wek serekîtirîn xisarberketiyê terorîzma spaha pasdaran, piştevanî li biryara Kanadayê dîkin”.


Deqa peyamê wiha ye:

Piştî Amrîkayê, welatê kanadayê jî spaha pasdaran a rêjîma Îranê, li listê rêkxiravên terorîstî, zêde kir. Ew biryara ku li roja Çarşemî 3ê Cozerdana 1403 a Rojî li berdewamiya pêdegirîya Îraniyan ên rûniştîyên welatên Rojava û bi taybet Îraniyên

li Kanadayê, û bersiva berdewamiya şerxwazî û kiryarên terorîstî yên komara Îslamî dan, serkevîneke din bo hemû azadîxwazên Îranê bi taybet malbatên dadxwaz ên netewên li Îranê ye.

Em hîvîdar in ku Yekîtiya Ewropayê jî bersiva dadxwaziyên xelkê Îranê bide û spaha pasdaran wek rêkxiraveke terorîstî nas bike, Ew biryara Kanadayê, ji aliyê piraniya xelkê Îranê bi taybet ji aliyê netewa Kurd û Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê ve ku qurbanîyê zêdetirîn kiryarên terorîstî û cinayetê spaha pasdaran e, tê pêşewazîkirin

Misfeta Hicrî



Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizbba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê 31ê Cozerdana 1403 a Rojî

Rêzdar Mistefa Hicrî li derheq çandina dar li bajarê Viyênê bo daya “Dr. Qasimlo, peyamek belav kir

Rêzdar Mistefa Hicrî, berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê, bi belavkirina peyamekê, çandina darekê li bajarê “Viyênê”ê paytexta Otrîşê li 35emîn salvegera terorkirina “Dr. Qasimlo”, bi bilind nixand.

Deqa peyamê wiha ye:

Roja “27ê June”, Parlemana îyaleti ya Viyênê, biryar da ku bo bîranîna 35emîn salvegera terorkirina rêberê Kurd, Dr. Qasimlo” û hevrêyên vî,

“Ebdulla Qadirîzezer û Fazil Resûl” li parkeke wî bajarî de darekê biçînin.

Ew çalakiya Partiya Kesk û bi taybet Xatûn “Bêrîvan Eslan”, cihê rêzgirtin û pêzanîne ye.

Spasiya hemû tekoşîna wan dîkin û hîvîdar in ku ew bibe hêvinê dubare birêkxistina dosyeya terorkirina “Dr. Qasimlo”, li dadgeha wî welatî de.

Mistefa Hicrî

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmkokrat a Kurdistana Îranê



Qasimlo: fîlozofek jîr û parêzvanek cesûr




N. Elî Munezemî

Ger em felsefeya Platon (Eflatûn) bo şirove û raveya kesayetiya dr. Qasimlo bikar bînin, ew yek dikare alavên pêdivî bow î karê giran bêxe ber destan û ciyê layiqê wî di cikava Kurdistanê de destnîşan bike. Lê mixabin di kurte gotarekê bo weşandin li rojnamê de cî nîn e ku bi hûrî em hemû wan karakter û xalên felsefî yên felsefeya Platon de ku dikarin bo zelalkirina kesayetiya dr. Qasimlo bikar bînin. Li ber wê hindê pêdiviya ku her li destpêkê de em lêbîhorîna xwe li ruhê pakrevan dr. Qasimlo û hemû xwendevanên hêja bixwazin.

Platon di pirtûka xwe a bi navê «Komar»ê de dibêje «Kesek wêrek, çalak û bi hêz û xwedî cewherê felsefî (kesên zana û xwedî zanist) dikare bibe parêzgerê civakê.» Ger em ji-yana dr. Qasimlo li ber çavan re derbas bikin, hemû ew rengdêr bi başî dixuyin. Qasimlo kesek cesûr û wêrek bû. Ew cesaret bû ew teşwîq dikir ku bikare serî li hember neyar û dijminan de rake û di hemû rewşên aloz û tengav de bi ruhek mezin li ser hemû dijwarîyan de serkeve û li ser rîya azadîyê berdewam be.

Ew her wisa kesek xwedî zanist û cewhereke felsefî bû. Eger em şirove û nêrînê wî guhdarî bikin yan bixwînin, ew nêrîn û hizrên wî yên kûr û berfireh dide eyankirin ku Qasimlo xwediyê ramanên bilind û hizrên kûr bû û ew yek jî bi sedema wê hindê bû ku ew xwediyê zanist û hişyarîya zêde bû di warê kar û xebata xwe de.

Perwerdê di felsefeya Platon de cihek taybet heye û Platon li ser wê baverêye ku meriv dibe hem li aliyê laş û hem jî li aliyê ruh xwe perwerde bike. Di wir de perwerdeya ruh tê



wateya perwerdeya hizr û raman bo jîrbûnê. Qasimlo her di zarokatiyê de laş û hizrên xwe perwerde kiribûn. Ewî li hêlekê bi geriyên li çiya û lîstika fûtbolê laşê xwe perwerde kiribû û li hêla din jî bi guhdarîkirin li dastanên şoreşên azadîxwazî yên kurdan û serpêhatiya rêberên wan şoreşan, xwe bi rûhiyeta rêberê şoreşvan wek Simkoyê Şikak pêgihîştandibû.

Serçaveya pêgihîştandina dr. Qasimlo serçaveyek zelal û pak bû ew yek jî bû sedem ku ew jî rêberê qenc be. Platon dibêje ku «Ji bo ku ciwanên civaka me wêrek û netirs bibin, divê em ji wan re wan çîrokan bibêjin ku ewan li tîrsa mirinê rizgar bikin» û «Mirovê netirs li qada şer de, mirinê baştir dizane li êxsîrîyê.» Qasimlo jî ku basa pêşmerge dike, wê yekê tîne ziman ku pêşmerge bi wateya çûn bo beroka mirinê e û ew yekê bow î xwe jî rast bû. Ew jî pêşmerge bû û pêşmerge bo

parastina neteweya xwe, çavê xwe li ser jiyane de digre û çavnetirsane diçe bo berevanî li netewe û welatê xwe. Ew her wisa hezaran car mirinê tercîh dide li ser jiyana li êxsîrîyê.

Qasimlo jî dibêje ku “kurd evîndarê mirinê nîn e, evîndarê jiyane e.”Lê eger bo azadiyê pêdivî be, meriv dikare bimre.

“ewên ku fêr dibin baş bijîn, dikarin baş jî bimrin.” Ew mirina ku mebesta Qasimlo e, mirina layiqê pakrevan e ku wan di hizr û dilê neteweya wan de dike nemir. Qasimlo bi wan gotinan nîşan dida ku hem bi xwe wêrek û çavnetir e û hem jî dixwest pêşmerge û hevçeperên xwe bi wî awayî perwerde bike.

Platon dibêje ku “Mirovê bîaqil mirina hevalê xwe li qada şer wek qe-

dereke reş nabîne” û “mirovêkî wisa ji bo hevalê xwe yê li qada şer hatiye kuştin nagirî.” Ew yek gotina Qasimloye jî û dibêje ku “Em bo şehîdên xwe nagrîn. Ewa ku em dibe bikin da ku li hember bîranîna wan şehîdan de şermazar nebin, ewaye ku em rêya wan bernedin û wek wan heta serî li ser wê rêyê berdewam bin.”

Em jî dibe wek xwendekarê mekte dr. Qasimlo wan şîret û karakterên wî her tim di bîra xwe de bigrin û di xebat û berxwedana xwe de bi kar bînin. Ew yekê dikare xebata me bi hêztir û serkevtina me destber bike. Gotin li ser kesayetiya, raman û jiyana Qasimlo pirtûk têrê nakin. Ez niha li ser projeyekê dixebtim û min dixwest ku bo 35mîn salvegera şehîdbûna dr. Qasimlo bigihîje destê we.

Lê mixabin amade nebû. Lê ez soz didim ku ew kar bi zûyî bê kirin. Ew yekê erkeke li ser mile me ku em hizr û ramanên Qasimlo şirove û nîqaş bikin û bi wî rengî nehêlin dijmin bigihîje armanca xwe û bi şehîdkirina wî, wî li neteweya me bistîne. Heta ew hizr û raman berdewam bin, Qasimlo jî li jiyana me de berdewam e.

Ew nivîsa yê wîrda de biqede lê kar û xebat li ser hizr û ramanên Qasimlo bi sedan nîfşa naqede. Ruhê dr. Qasimlo û hemû pakrevan şad û rêbaza wan bo gihîştin bi serxwebûn û azadiyê domdar be!



Dr. Qasimlo jiyanekî zelal û pak bihorand



N. Letif Epozdemir

Rayedar û dîplomatê Kurd, Dr. Abdu-rehman Qasimlo roja 22.12.1930'yan di "Şeva Yelda" de, li Deriyê Qasimlo, li teniştê qeleya Dimdim a li Urmîyê hatîye dinyayê.

"Şeva Yelda" yanî bi gotina Kurda "Çile" di raza efsaneyê Zerdeşt te, "Yelda" bi wateya "Ji nû ve Zaîn" e. Ev şev, şeva herî dirêj a salê ye.

Duktur Qasimlo di rojêke pîroz de, wek xelateke Yezdan hatîye dinyayê. Ew keremeke mezin e ji bo hemu Kurdan.

Wî perwerdeya xwe a akademîk li Çekyayê kiribu. Dema ku li wir bu, bi xanim Helen Krulich re, hevnas bu. Lê, gelê Kurdistanê Helen xanimê wek Nesrîn Xanim, nas kir û di dilê xwe de jê re cîh vekir. Ji zewaca Qasimlo û Nesrîn xanimê di sala 1953'an de MÎNA û piştî du salên din jî, HÎWA hatin dinyayê. Herdu keç jî, her wek dê û babê xwe, çalak û jêhatî bun.

Di wan salan de, Nesrîn Xanim gelek caran hate Kurdistanê. Li nav dol û çîyayên Kurdistanê, di wan şertên zor û zehmet de, wekî pêşmergeyek dîpola, xizmetê kir.

Dr. Qasimlo miroveke nazîk û lewend bu. Rûken û xweşbêj û dilgerm bu. Em sê salan bihevre man. Min rojekî nedît ku bi hevrêyêkê xwe re tûre bibe. Dr. Qasimlo Ew diplomat û lêzaneke bû. Ji xeynî zimanê Kurdî (Kurmançî û Soranî, deh zimanê Cîhanê dizanî. Farisî, Erebi, Tûrkî, Azerî, Rûsî, Îngilîsî, Fransî, Almanî, Çekî û bi Silovakî baş dizanî.

Carol Prunhuber, di gotara xwe a bi navê "Mebesta Evdirehmanê Kurd û Mirina wî : Xeyal kirina Kurdistanê." (The Passion and Death of Rahman the Kurd: Dreaming Kurdistan) de derheqê lehengê Kurd Qasimlo de wiha dibêje: "Di hemû jîyana xwe de xwest ku ji bo gelê xwe aştîyeke mayînde pêk bîne. Ew serokek şorişger yê navdar a tevgera Kurdên Îranê bû. Di sala 1989'an de, li Vîyanayê, di dema hevdişînek ji bo pêkanîna peymanê aştîyane, digel berpîrsên dewleta Îranê re, bi aw-


eyeke hovane hate tiror kirin. Şewqa wî a ronîdar di şanoya siyasî a dinyayê de, li ser siyaseta gûherbar a Rojhilata Navîn a dûr de, hê jî di beriqe."

Dr. Qasimlo di dema hilweşandina rejîma zordest a Şahê Îranê (1979) de roleke sereke leyîstibû. Piştî gûherîna rejîmê, wî xwest ku bi Xûmeynî re li ser sazûmanê demokrat û azad lihev were. Lê, Xûmeynî, xwe neda ber tişteke wiha. Lewraye ku Kurdan piştî şorişê Îranê bi salek, neçar man dest avêtin çekê xwe û rêya çîyayên Kurdistanê girtin, li himberê rejîma nû a Xûmeynî jî, dest bi şerê çekdarî kirin. Helbet şer û çek hilgirtin, ne bi kêfa Kurda bu. Lê mixabin ku tû rêyek din nema bu li ber Kurdên Rojhilatê. Qasimlo wek rêberekî lêzan li pêş pêşmergeyan, destbîçek, di sengerê parastina can û mal û şerefa milletê Kurd de, cîyê xwe girt û li bereya şerê azadîya Kurdistanê de, digel pêşmergeyan beşdarê şerê germ bu. Şerêke tûnd û dijwar didomîya di wan salan de. Em hemû bihevre di şer de bûn. Parastina axa Kurdistanê, doza azadîya Kurdistanê me bi hev re dizeliqand û dikir yek beden. Seferberîyeke mezin destpêkiribu. "Mangî Difa li Azadî" wek "Meha Parastina Azadîyê" hatibu beyan kirin. Hemû gelê Rojhilata Kurdistanê lipê bû, Kurd çaverêya azadîyê bûn.

Di heman demê de, 60 hezar metreqare axa Kurdistanê hatibû rizgar kirin : Arteşêke têkoşer hatibû durist kirin. Her kes xwe wek pêşmerge amade dikir. Çil hezar hêza pêşmergan, 20 hezar ji "Hêza Bergîrya Millî" berîte ji xelkê rojhilata Kurdistanê, çek bidest, di sengerên parastina hebûna milletê Kurd de, bi şev û roj parêzgarî dikirin. Kelecanî û mîrxasîya wan rojan qet nayê jibir kirin. Di vê seferberîyê de 117 pêşmerge şehîd bun, ji wan 11 kes hevalên min bun, ku me li wir, hev nas kiribû û bihevre hevaldestîyeke dilsoz pêk anîbû.

Çirçê û Şivan, Sîrwan, Hesên û Fetah û Hejar, û Hesênê Sorawî, her yek gernaseke bê emsal bun. Jiyanê xwe a pak û zelal fedayê azadîya Kurdistanê kirin. Gernasî û pakrewanîya Hesênê Sorawî û fermanderê giştî Hejar Mukrîyanî, Eli Sultanpûr hêjayê pesnên gelek mezin in.

Li serê girê teniştê Mehabadê padî-ganeke leşkerê dirindeyê Îranê hebû. Mîna Kûnda kor, bajarê Mahabadê raçav dikir. Eger Mehabad nehata terikandin bîgûman wê xelkê Ma-



habadê gelek xesareke mezin bidîta. Lewra Qasimlo fermana paşekêşiyê da, pêşmerge ji Mehabadê hate der. Lê ev yek peyameke gelek baş bû ji bo dijminên milletê Kurd. Ev biryar dabû nişan ku Qasimlo, di hûnerê şer û leşkerî de jî, hostayeke baş e. Dûktor li ser diroka Kurdistanê jî, bi navê "Kurdistan û Kurd" kitêbek jî nivsandibû ku bi destnîşana xwe yekî dabû min jî.

Ez yek ji karmendê "Radyo Dengê Kurdistan" beşê Kurmançî Şikakî bûm. Min nûçe dixwendin li ser radyoyê. Berpirs û midûrê min bi rehmet bî Kerîm Hesamî bu. Paşî Mela Ebdula Hesenzade bû midûrê radyoyê. Teha Atîqî rêveberê weşanan bû. Ehmed Şêrbegî, bêjereke ajîtor bû, bi soranî nûçe dixwendin. Kek Ehmed ji bo min îdolek baş bû. Duktur digot "Ehmed bibin bereya şer, bila li wir nûçeyan bixwîne, wê hemû pasdar ji tîrsan birevin."

Qasimlo rojekê ji min re got: "Kek Hesên tu, endamê Partîyeke Sosyalîst î. Ji bo çî tu şevêkî li ser sosyalîzmê semînarekî nadî? Başê ku hevalê me bizanin ka gelo sosyalîzm çîye." Min ev pêşnîyara Qasimlo wek "emrek" qebûl kir û paşî hefteyek di roja şemiyê de, bi beşdarî û gûhdarîya nêzîkî 100 kesan ku yek jî wan jî Qasimlo bû û yê din jî Dr. Seîd Şerefkendî bû. Digel wan, her wiha hemû endamên (deftêra Siyasî) yanî polît bîroya HDK-î jî li wir amade bûn. Min dest bi semînarê kir. Wekî seetek axaftina min dewam kir. Ez li ser "Diktatorîya Proleterîyê sekînim û min li gor zanîna xwe qala pergala sosyalîzmê kir. Duktur piştî ku axaftina min qedîya, berê xwe da beşdaran û got: "Hevrêyan ew tiştê ku Kek Hesên qal kir, hemû jî gelek basin, Bes yek tiştê gelek xirab e, Ew jî pîrsgireka "Dîktatorîyê" ye, Lewra bi raya min, kesên demokrat nabe ku bi hîç şeweyek terefîdar yan jî parêzgerên "diktatorîyê" bin. Eger

ev diktatorî a karkeran jî be, li dawîyê kûtahî bi demokrasîyê tîne. Sosyalîzm baş e, lê divê xwe ji diktatorîyê dûr bixe."

Piştî 15 rojan dîsa di şevbêrkek zivistanê de, di bin koneke dehling de, piştî xwarina êvarê, sihbeteke germ dest pê kiribû. Di çadîrê de, dîsa jî 100 kesan zêdetir beşdar hebûn. Me hemû gûhdarî li Duktur Qasimlo dikir. Xweşhalim ku ez li teniştê wî rûniştî bûm di dema vê sohbe de. Ev car mijar û babet "Dîroka Siyasî û Civakîya Kurdistanê" bû. Piştî şiroveyên kûr û dirêj, li dawîyê bi van gotinan axaftina xwe qedand "Em Kurd milletêkî bêsiûd in. Herkesek bûye xwedî desthilat, hê em bindest in. Çadîreke meye azad jî tune ye. Ji bo gûhertina vê qedera reş, bi milyonan dostê me hebin dîsa ne bes e, lê eger yek neferek jî neyarê me hebî, pir zêde ye."

Di mihbeteke din de, dîsan Duktur Qasimlo qala rewşa siyasî a rojhilata navîn û dabeşkirina Kurdistanê dikir. "Kurdistan bey rizayê xwe, sedem xwestin û erêkirina dewletên emperyal hate dabeşkirin, bû çar heta pênc perçe. Ev qedereke xirab e û divê milletê Kurd ta ebed vê rewşa dabeşkirî qebûl neke." Paşê di kûranîya axaftina xwe de Qasimlo berê xwe da min û pêre wiha got: "Em Kurd in, Bi guherîna dîrokê em miletekin ku li pênc dewleta dabeş bûne. Benkê biratiyê ye ku me bi hev re girê dide. Li kû derê dibin bila bibin, bi hemû Kurdên cîhanê re, ev ben wê her dem me bihev re girê bide."

Duktur Qasimlo, şarezayek hêvîdar û xweşbîn û dûrbîn bû.

Bi rehmet bî Duktur Qasimlo. Rûhşad bî, her tim di nav nûr û ronahîyê de bimînî. Ez gelekî şanaz û kûbarim ku min cenabê te naskir.

Ezê tu carî te jibîr nekim. Ez Letif, ew kesê ku te lê bi navê Hesên Dîyarî nas dikir.

Tehran bû Kurdistan, guhertin tê



N. Kawe Ahengerî
W. Hesên Mukerem

Di bizava Jin, Jiyan, Azadî de sloganek li kolanên Tehranê hat bilindkirin ku ji bo gelek kesan têgihîştina wê zehmet bû, lê ev silogan di hilbijartinên sala 1403'an a Rojî de cih girt û Tehran li hember rejîma desthilatdar a Îranê bû Kurdistan.

Silogana “Bila Tehran bibe Kurdistan, Îranê bibe Golistan” li gel “Bimre dîktator” siloganên stratejîk bûn ku ji aliyê xwepêşanderan ve di dema tevgera Jînayê de li kolanên Tehranê hatin avêtin. Beriya ku em zêde behsa vê mijarê bikin, pêwîst e behsa xaleke din a girîng jî were kirin.

Di heyama 45 salên jiyana Komara Îslamî de, bi taybetî piştî mirina Xumeynî damezrînerê Komara Îslamî, heya îro, her du aliyên hikûmetê ji bo ceribandina şîyan û şarezayîyên xwe di birêvebirina welat û bidestveanîna piştigiriya gelên Îranê, dem hebûne.

Piştî ezmûna 16 salan a desthilatdariya reformxwaz, bi taybetî di heyama du serdemên Xatemi û Rûhanî de, bi baweriya min “na”ya mezin a gelên Îranê di destbiserkirinên roja îna borî de, “na” ji reformxwazên hikûmetê re bû.

Ji ber ku gelên Îranê di sala 1376'an a Rojî de bi zelaî ji binemalîstan derbas kiribûn. Lê piştî 30 salan ji hebûna ne rast, bê stratejiyeke geleri û perspektîfa siyasî ya demokratîk a vê qonaxê, vê carê gelê Îranê nîşanî cîhanê dan ku bi her du alîyan ve, hemû sîstemê bi ser ketin e.

Sertîfîkayên nasnameyên bê xwedî û dengên betal jî di nav de, rêjeya beşdarbûnê herî baş ji sedî 30 ye. Helbet ev ji sedî 30 nikare wek “rastî” û “azad” were hesibandin jî ji ber ku hinek ji xelkê Îranê ji ber sedemên kar,



gefên ewlehiyê û heta hêviya (derew) ji reformxwazên hikûmetê çûne ser sindoqên dengdanê. Bê şik di hilbijartineke azad û hevrikî de lihevhatina dangan, rêjeya beşdarbûna gel û berendaman bi tevahî ji hev cuda dibe.

Beriya randevûyanên rejîmê, peyameke dengî ya Seyîd Mihemed Xatemi Şêxê reformxwazên hikûmetê hat belavkirin û tê de ji reformxwazên hikûmetê re gotibû: “Ji bo carekê be jî em li gel xelkê bin”.

Ev peyamek bi awayekî berfireh di medyaya civakî û di nav çalakvanên siyasî de cih girt. Di rastî de, ev peyamek, soz û helwesta Seyîd Mihemed Xatemi, serkomarê berê yê Komara Îslamî li bara hilbijartinên dahatî yê rejîmê bû.

Lê Mihemed Xatemi careke din soza xwe bînpê kir û kete lîstika zengila dijwar a desthilatê bi serokatîya Xamineyî û li kêlega xelkê nesekinî. Eva li halekê ye ku piraniya teqez a Îranê bi herî medenî “na”yeke mezin ji randevûyên rejîma Xamineyî re got in.

Piştî jimartina dangan li seranserê Îranê, Wezareta Navxwe ya Komara Îslamî ya Îranê rêjeya beşdariya li seranserê Îranê eşkere kir. Ger em vê îstatîstîkê esas bigirin jî, du rêjeya beşdarbûnê balkêş in.

Her çendî rêjeya kêma beşdariya xelkê roja îne di dîroka Komara Îslamî de bêmînak e û rêjeya beşdariya xelkê li seranserê Îranê bi awayekî berçav kêma bûye, lê xala balkêş amara Teh-

ran û Kurdistanê ye ku her du amaje bi wê yekê bûne. rêjeya beşdarbûnê ji sedî 23 ne.

Helbet û bê şik para bi zanebûnên ku li Kurdistanê deng dane karmendên îdarî û leşkerî ne. Kesên ne xwecihî ku rêjeyeke berçav a beşdarbûna hilbijartinên rejîmê li Kurdistanê pêk tînin.

Piştî derbasbûna 45 salan, dilê bitevgera azadîxwaz a (Kurdistan) û navenda guherînê li Îranê (Tehran) li dijî rejîma Xamineyî ketine nav têkoşîneke hevgerî û hemahengî de. Ev bûyer dikare ji bo Îranê bibe hêviya guherînê.

Tiştê ku niha divê bi awayekî micid were lêkolîn û şopandin, lihevkirina siyasî ya van her du herêman û şerê dijî rejîma Xamineyî ye ku berpirsiyariya wê girîngtir e li ser milê partiyên Kurdistanê bi giştî û Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê bi taybetî û yê din û partiyên siyasî û çalakvanên Îranê ye.

Ez di vê baweriyê de me ku ger ev hevahengiya di navbera opozîsyonê de bi micidî were şopandin, gera duyem a destnîşankirina rejîmê dikare bi hêz, hevrêzî û hemahengiya zêdetir were dorpeçkirin.



Nerîna



“Mistefa Hicrî”:

“Xelkê Îranê, hîlbijartinan baykot dîkin û tî rewatiyekê nadne komara Îslamî”



“Israel Katz”:

“Komara Îslamî ji bo Îsraîl, Ukrayna û cîhanê metirsî ye û berî ku dereng nebe divê pêşiya Tehranê bê girtin”



“Recep Tayyîp Erdogan” :

“ Divê Îsraîl neçar bikin ku agir-beştê qebûl bike”



“Ethan A. Goldrich”:

“ Em nafikirin ku ji Sûriyeyê vekişin, em difikirin ku peywira xwe ya rêlibergirtina vejîna DAIŞê bi hevkarên xwe yên herêmî re bi-domînin”

Serokkomarê lat û lûtan, serokkomarê neteweyên mafxwarî nîn e!



N. Eskender Ceiferî

Ev 45 sal in ku li Îranê serokkomarekî bêdesthilat tî hîlbijartin. Beriya wê, desthilat tenê ya Şayê Farsan bû ku neteweyên mafxwarî tepeser dikirin. Niha jî heman siyaseta ji aliyê weliyê feqîh ve tî berdewamkirin.

Ji sala 1979'an ve 14 gerrên hîlbijartinên serokkomariyê û hîlbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî/ê nekarî bibe berendamek rastîn ji bo gelê xwe. Sedemê baykotkirinê jî her ev e. Ji ber ku ew xwe, li Îranê xwedîmaf dibînin lê mafê wan hatiye zewtkirin. Ti kesek xwedî wîjdan ji neteweyên mafxwarî wisa nabîne ku dê ev rêjîm mafên wan bide.

Di 13 gerran de heşt kes weke serokkomar hatibûn hîlbijartin. Helbet desthilata wan sîncor e û nikarin tiştêkê bêjin ku li gor Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Piştî mirina Îbrahîm Reyîsî, niha diviyabû serokkomarekî din ji bo rêjîmê bihata hîlbijartin.

Mesûd Pizîşkiyan û Seîd Celîlî ku du berpîrsên berê yê rêjîmê ne, destên wan di komên girêdayî Sipahê de jî hebûne ku ji komên çete pêk tên. Wate her yek ji wan bî hîlbijartin, ew dibe serokkomarê lat û lûtan.

Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hîlbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hîlbijartinan baykot dîkin.

Di salên di navbera 1979'an de heya 1981'an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981'an take sal bû ku du caran li wî welatî hîlbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî heyvekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, Mihemed Xatêmî, Mehmûd Ehmedînîjad û Hesen Rûhanî her yek du caran serokkomar bûn. Îbrshîm Reyîsî jî berî ku çar salên xwe bi dawî bike, di hêlikoptêrê de hate kuştin. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî b

dawîhatina dema çar salên xwe, car



din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînîjad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin berendam lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hîlbijartinên sala 2009'an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezaretê Navxwe ve hatibû tomakirin. Mehmûd Ehmedînîjad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku rêformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên dîmokratîk, gelek dangan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezaretê Navxwe ragihand ku navê Ehmedînîjad car din ji sindûqan derketiye. Rêjîmê îdia kir ku di wan hîlbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 45 salan de piştî gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, niha bi berdewambûna şoreşa Jînayê, ev rêjîm xwedîya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bûye. Destpêka avakirina Komara Îslamî di yekemîn gerra hîlbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekîşîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hîlbijartina herî dawî ya 2024'an de sedan kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarî selahiyetê bistînin.

Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingeşîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdêyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwedîyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî

dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dîrxistin û pişt re li koçberiyê li Fransayê mir. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li piştê Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de piştê Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dîrxistina wî ji posta serokkomariyê. Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tomata hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwest bibin berendamên serokkomariya Îranê. Mîrhusên Mûsewî û Mêhdî Kerûbî jî ku di hîlbijartinên sala 2009'an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarî bi ser Ehmedînîjad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên danganê anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Kurd dibêjin eger Dr. Ebdulrehman Qadimlû serkirdêyê şehîd ê Partiya Dîmokrat a Kurdistanê Îranê û Fuad Mistefa Sultanî serkirdêyê Komelê bikariya mafê xweseriyê ji bo Kurdan ji Tehranê bistînin berî ku bîne tîrorkirin, dikarîbûn bibin berendamên serokkomariya Îranê jî. Ew dibêjin Komara Îslamî hewl dide hemû hêzên opozîsyonê, dijberên xwe û serkirdêyên wan jî nav bibe. Fuad Mistefa Sultanî sala 1979'an li nêzîkî gundê Bestam li ser rîya di navbera Bane û Merîwanê de hate tîrorkirin. Dr. Qasimlû jî sala 1989'an li Wiyena paytexta Austria ji aliyê tîrorkîstên Îranê ve hate tîrorkirin.

Lê piştî 45 salan, para Kurdan, hîn her belengazî ye. Lewma jî wan vî carê jî hevdem ligel berdewamiya şoreşa Jînayê, hîlbijartinên rêjîmê ji bo kesekî ku bikeve dewsa Îbrahîm Reyîsî baykot kirin.

Derxistina hîcabê, an jî hicaba bizorê



N: Rojan Kurmanc

W: Hesên Mukerem

Riza Şah 89 salan berê piştî hevdî-tina bi Ata Turk re û teqlîdkirina siyaseta yekitiya gelan ji bo tepe-serkirina kurdan, Riza Şah ket ser şopa Ana Turk.

Di gava yekem de hicab ji serê jinan derxist û her kes neçar ma ku cil û bergên wek Ewropîyan li xwe bikin, piştî zext li gelê kurd kir ku dev ji koçeriyê berdîn û li cihekî bi cih bibin, lê bi bextewarî desthilatdariya wî bi dawî bû negihîşt armancên xwe.

Piştî 50 salan, dema ku hikûmeta Komara Îslamî hat ser kar, wan bi darê zorê hicab û çadira reş danîn ser serê jinan û heta lixwekirina pêlavên panî bilind jî heram kirin, ji ber ku li gorî wan ev yek ji bo mêran tevgereke teşwîqê bû. Her wiha mafê wan tunebû ku kirasên teng û kurt li xwe bikin û tattoş wek sûc dihatin hesibandin û porê dirêj ji bo mêran qedexe bû.

Xumeynî ku damezrênerê Komara Îslamî bû, ji bo kontrolkirina xelkê û qutkirina peywendiyên wan bi derve re, bikaranîna televîzyonê heram ragihand, lê hêdî hêdî dema ku gel hişyar bû, neçar man ku rawestin û bikaranîna wê, û hêdî hêdî, nîqaşên li ser heram bûna televîzyonê kevin bûn, ji ber ku bi pêşketina teknolojiyê û nûvekirina zanistê re, mirov berê xwe dabûn bikaranîna amûrên vîdyoyê yê malê. Vê carê jî dewlet û me-layan ne tenê bikaranîna amûrên vîdyoyê qedexe kiribûn, lê ji bo wê jî cezayê girtîgehê û cezayên pereyan jî nixandibûn.

Di vê qonaxê de, gel serketî bû ji ber ku karanîna vîdyoyên malê ewqas giştî bû ku ew tiştek normal dihat hesibandin.

Bi pêşketina teknolojiyê re gel ji bikaranîna televîzyon û vîdyoyê têr nebû, ji bo ku bi nûçeyên rojê bizanibe serî li danîna satelaytan, rejîmê jî bo pêşgirtinê wê yekê, girûpên besîcan çalak kirin êrîş dirin bo ser malan û satelayt kom

dikirin û xwediye satelaytan re cezayê pere dibirîn.

Ev nakokî di navbera gel û hikûmetê de berdewam bû heta ku bikaranîna satelaytan bû tiştekî adetî û komkirina sêlên satelaytê hat rawestandin.

Gel bi taybetî jî jin êdî bi mafên xwe haydar bûn û ji bo mafên xwe zêdetir daxwazên xwe xwestin.

Weke Mafê perwerdehiyê, cureyên vegirtina vebijarkî, zewac, mafên jinberdanê, kar, heqdest, wekhev a bi mêran re.

Her ji rojên destpêkê yê hatina ser kare Komara Îslamî ve ku Kurd bi êşkera dijberiya xwe li hember Komara Îslamî û Xumeynî ragihand, hertim bindest bûn û hertim ji bûn mertala belayan. Berî 21 mehên, mirina Jîna (Mehsa) Emînî, keça Kurd, ji aliyê hikûmetê ve, bû çirûska ku dirûşma Jin, Jiyan Azadî ji Kurdistanê Îranê ve, ji wir jî ber bi paytextê ve û piştî jî li hemû cîhanê deng veda.


Xelkê ku ji enflasyona bilind, bêkarî, nebûna sotemeniyê, zêdehiya mela û hîcaba bizorê û ... hwd bêzar bûne, ji roja mirina Jîna yê ve dest bi serhildanê kirine.

Di rojên 7 û çileya Jînayê de, dewleta Îslamî şahidê hejandina bingeheên Komara Îslamî bû û serkeftina rastî li ser nerastiyê de ku nêzik dîtî, û bi êşkera şer li dijî xelkê xwepêşander ragihand. Xwepêşanderan bi taybetî li bajarên Kurdistan xwe li nav kuçe û kolanên çeper girtin û bi destên vala û carna jî bi bombeyên xwemalî bi rojan li hember hêzên dewletê li ber xwe dan.

Li Têhran û bajarên din gel daket kolanên û bi qîrîna dirûşmên Jin, Jiyan, Azadî û şewitandina laçikan û birîna porê xwe weke nîşaneyê şînê, nerazîbûna xwe nîşan dan. Jî destpêkê desthilata Komara Îslamî ve heya niha gelek xwenîşandan li dar ketine, cudahiya sereke di navbera wan xwepêşandanan de ji xwepêşandanan din ew bû ku bi pêşengiya jin û keçên ciwan dihatin birêvebirin û bi piranî girûpên biçûk li cihên cuda dihatin lidarxistin.

Lê mijara ku pir girîng bû, rawestana mêran û parastina jinên berxwedêr li hember hikûmetê bû.

Dema ku hêzên tepeserker yê hikûmetê bi serkirde û keçên serqot re rû bi rû dibûn, ajanên



hikûmetê hewl didan wan birevînin û wan bixin ser kamyoneke (tromobîla mirinê) û lê mêran bi fedekarî, di gelek rewşan de bi ser ketin û wan keçan ji destên ajanên dewletê rizgar kirin û di hin rewşan de bedelên giran dane vê fidakariyê.

Lê pirseke girîng derdikeve pêş, ji bilî çî di van tromobîlên Geştê Îrşad an jî navenda binçavkirinê de diqewime, ku mêr amade bûn ji bo rizgarkirina keçên xwepêşander canê xwe feda bikin.

Keçên ku nekarîna birevin, ji dema hatin girtin rastî bîrêzî û lêdan û îstîsmara zayendî dihatin.

Di vê serhildanê de karbidestên hikûmetê bi hovîti hemû kaos, mirin û fesadîya rûmetê heta ku ji destê wan dihat nîşan dan. Wan xwe ji encamdana tu socekê nediparastin.

Xwepêşander piştî ku hatin girtin û îşkence kirin, neçar bûn ji bo berjewendiya hikûmetê û li ber kamerayên hikûmetê îtirafek bi zorê bikin, eger nebe gefa kuştina kesûkarên wan li wan dihat xwarin.

Ger bi zorê îtiraf nedana wê îşkence berdewam bikira. Gelek girtî di îşkenceyê de bûn qurbanî. Li gor rapora pizîşka yasayî, sedema mirina wan ji aliyê tiştekî hişk li serê wan ketiye yan jî bi hejmareke zêde ya gulleyan ji dûr ve hatiye teqandin.

Di demjîmêrên destpêkê yê serhildana şoreşgerî de gelê Xorasanê Bakur jî ji bo piştgiya xwepêşanderan û hêrsa xwe ya li dijî desthilatdariyê nîşan da, dirûşma jiyana azadiya

Jij, Jiyan, Azadî bilind kirin.

Paşê jî êrîşî ofîsa pêşnimêjê Înê ya li Şîrwanê kirin û pêşnimêjê Înê jî bi şev bi eskorteke dewletê reviya Meşhedê.

Di pêngava din de xwepêşanderan agir berdan bankên Şîrwan û qebareya agir ewqas mezin bû ku heta mehekê bêhna darên şewitî li bajêr dihat.

Bi dana berhev a herdu hikûmetên Pehlewî û Komara Îslamî, em dibînin ku ti yek ji wan bi ser neketiye ku îradeya xelkê bikişîne û bi rastî çima?

Her du polîtîkayên ragihandina hicabê û hicaba bizorê di her du hikûmetan de bi ser neketin û divê cureyê hicabê bi serbestî were hilibijartin.

Zêdegaviyên di herdu hikûmetan de wisa jî kir ku mirov ji wan nefret bikin, Ji ber ku hîcab bijarte ye û divê cureyê kincan bi serbestî were hilibijartin. Hikûmeteke ku di hundirê xwe de gendel be û bingeha wê li ser zilmê hatiye avakirin, dikare heta çend salan karê xwe bidomîne.

Li welatê kurdan porê keçikan ji çavê kesî nayê veşartin.

Di welatê kurdan de çavên mêran bi dîtina porê xweşik tevî bûye.

Di xaka Kurdistan de por parçeyek ji hebûna jinê ye.

Li welatê min jin bi qîmet e, afirîner e.

Li welatê min (Da) yek (X) ji Xwedê kêmtir e.

Li welatê min, dayikên xemgîn ji porê xwe yê birîn zencîreyekê dixin ber zilma dilên zalim, mîna ku di zûtirîn dem de ev zencî li stûyê wan bê daliqandin.

Organîzasyonên sîyasî û tekoşînê jî wihane



N. Hasan Harrani

Beşa dawî

Qehremanîyên ku di vî 35 salî de li Bakur hatin kirin li ti tekoşînekî der-ekî cîhanê nehatîye kirin. Xeyn ji Filistinîyan.

Lê dêmegî kêşeya me Kurdan ne şer e. Kurd baş şer dikin. Ji hêla wêrekî û fedakarîyê de bi ser wan re kes nîne. Lê tiştên kême aqilekî berfireh, famkirina dijminê xwe û famkirina tiştên dixwaze ye. Yanî Kurd çî xwera dike û dixwaze çî ava bike divê pêşî ev di hiş û mejîyê wî de zelal bibe.

Mirov dema xanîyek çêdike hesabê hemî melzeme wî û li gora wî jî avakerê wî hesab dike. Jêre mihendis, hoste, endezyar û karker lazime. Ger xanîyê ti çêbikî tê de kesên pispore nexebitînin tuyê xanîyekî eletewş ava bikî û wê li pîya zêde nemîne. Şikl û teşeyê wî jî nexweşik be.

Yanî Kurd dixwazin çî bikin? Li gorî tiştên ku dixwazin ava bikin divê melzeme wî yê însan çî be û ji hêla zan-yarî, sîyasî, psîkolojîk, hiqûqa medenî û navcîhanî û civakî de bi çî awayî dagirtî be? Van pirsan muhîmin.

Kêmasî û qisûrê me Kurdan a van 25 salên dawî ev e. Berîya 25 sal berê her Kurd dizanîbû çî dixwaze. Lewre, zanîna mirovan di du waran de girînge. Yek mirov xwe li gora wî motive dike, dudu mirov li gora wî pispore diafirîne. Wan 25 salên dawî de tiştên ku Kurdan winda kir ev bû. Çî dixwazin? Erê armanc û daxwaz guherîn û motîvasyona bi hezaran tekoşer û mirov serobin bû.

Armanc û mebest çî bû ji holê rabû. Angaşten mirovan şîlo bûn û zelalî û pêşdîtinî cihê xwe da şîlobûnîyê û şik û gumanê. Krîza rêbertîyê dîsa wekî



hemî demên di dîrokêde qewimîbû rû da. Stratejîyên şaş û ne bawer, vegera ji daxwaza dewletbûnê, vejandina angaşta biratîya ku qet nebûye û nabe Kurd jê re hatin mecbûrkirin.

Ev aqilekî bû û kevirên vê rê piştî ku Kurd li salên '90 î bûn hêz û bawerî dan dewletê ku wê Kurd biserbikevin û wê bibin dewlet şûnde bi aqilê dewletê bi destê çepgirên sexte ên Tirk di nabyna dewlet û hêza Kurd de hate avêtin.

Dewletê wan şande ba me. Hatîn pesnê me dan. Piştî me mist dan. Gotin hun başin, hun xurtin û em ji we hez dikin. Lê çawa heta niha em bi hev re bûn divê em ji îro û şûn de ji bi hev re bin.

Di bin navê enternasyonalîyêde hedefên mezin û cazib dan pêşîya me. Ev singê me jî dinepixandin û me xwe li qatê esmanan dît. Lewre wan me baş dinasîya. Dizanî bû cihê me yê qels kuderê ye. Loma jî dizanîbû xîtabê wê derê bikin. Xîtabê cihê me yê herî lewaz kirin. Me ji armancên me dûr xistin. Armancên ku nepêkan bû ji me re cazib dan nîşandan û me angajê wan armancan kirin.

Aqilê dewletîyê ev e. Divê ti bîzanîbî ka tuyê kî çawa di kuderêde bixî kêmasîyê. Tuyê kî çawa bi çî têxî şaşîyê. Dewlet bi aqilê xwe tevdigerîya û xwedî tecrûbeyên hezar salî bû. Hafîze û bîra wî kûr bû û dizanî bû çî

bi çî awayê ti kirin, çî bi çî ji holê tê rakirin. Wiha jî kir.

Tiştên ku Kurdan de nebû ev aqil bû. Lewre ji vî aqilî bîyanbûn û nedizanî ev aqil bi çî rengî tevdigere û bi çî awayî kar dike. Hemî zeafên Kurdan ev e. Te tiştêkî zêdî wî nîşanî wî da yan wê jê bitirse teslîmê wî bibe, yan jê wê pê bê xapandin û bipejirîne.

Di tekoşîna Kurdan ya dawî a Bakur de jî ev xapandina pejirandinê pêk hat. Em bi biratîyê, bi welatek hevpar û demokratîk hatin xapandin. Ev gotin li zora gelek Kurdên dilpak û dilsoz diçe lê rastî ev e. Lê êdî gelekên Kurdan jî vîya dizanin.

Wekî min li jor jî got; mesela me ne îdeolojîne. Hun dikarin bi îdeolojîya sosyalîzma demokratîk jî welatek ava bikin. Ev jibo hun dewletek, welatek ava bikin ne asteng e. Asteng ewe ku em çî dixwazin û amadekarîyên me jibo tiştên ku dixwazin çîye?

Pirsgirêka me ev e. Wekî Demîrel jî gotibû, gotina ku digot” hun dewlet jî ji vana re ava bikin nikarin îdare bikin” jibo rewşa me ya îron wek nîf-teyêye. Ev ne mezinbûna Demîrel e, teşhîsa rastîya me ye.

Îro li tevgera Kurd binêrin, jibo bibe dewlet ti kadroyên wî yên xwedî mantelîteya dewletbûnê nînin. Hun bigerin çar kesên xwedî mantelîyekî ez behsê dikim nîne. Ez vîya jibo Ba-

kur dibêjim. Ev ne derewe, ev rastîyeke.

Lewre hişmendîya dewletê, zagon û exlaqê dewletê cudane û ne li gorî beşekî civakê tenêye. Raste, xwedîyê vê hêzê herdem hêza serdest û maldar bûye lê pergala bi tevî parastina xwedîyê xwe jibo hemî beşên civakê tîne pesendkirin. Yan wê Kurd vê yekê bipejirînin, bibin dewlet û li rûyê cîhanê hebûna xwe berdewam bikin yan jî wê di nava çerxa biratîyê de bîhelin.

Hîna jî şensê Kurdan jibo armanca rasteqîn heye. Bes bila ew barîyerên ku ji xwe re çêkîrine û nahêlin wan bi hêzên cîhanêre tîkildar bike ji pêşîya xwe rabikin.

Îro di nava civaka Kurdan de tiştên jibo Kurdan pêwîst e ji pêşeroja xwe der û hîkmetên mezin derêxin û ji bo paşeroja xwe jî aqilekî dewletbûnê, modêlekî li gorî norm û huquqa navnetewî û ûjdanekî mirovayetî di nava hevde birêsin bihonin û bînin wicûdê. Ji vîya re pêdivîya çarenûsekî rêbertîyê ku bikaribe vê projeyê bîne ziman û civaka xwe pê serwest bike heye. Krîza rêbertî avakirina aqilekî komelgehî û dewletîyê dibe ku bi vî awayî pêkan bibe.

Divê em vê yekê jibîr nekin. Kurd divê biryara xwe ji nû ve bide vê biryarê li der ve li ser axa xwe bi vîna xwe ya azad bide. Riya xelasîyê ev e.

Serpêhatiya keçek kurd bi xortekî biyanî re



N. Sumeye Mêrxaz

Navê min Ciwane ye, ez keçek kurd im, û çîroka min çîroka evîne ye. Min evîna welatê xwe berda û ketim pey evîneke derew û ev destpêka çîroka min e.

“Me îro zanîngeha xwe kuta kir, û bawernamê xwe girt” û min bi rûyekî li ken û dilekî şah ji hevalê xwe re got. Sekinî û ket nav xeyalên xwe, bi xeyalê xwe gihîşt cem yarê xwe Mihemed, û gotinê xwe di dilê xwe berdeyam kir û got: “Mihemedê min jî bi min re şa bibe, ev bû pênc sal em herduk li benda vê rojê ne”

“Ciwane, Ciwane, keçê aqilê te kuda çû?”

Di vê demê de Ciwane bi dengê hevalê xwe re şiyar bû û jê re got: “Min biborîne, ez hinekî mijûl bûm” Hemû heval ji zanîngehê derketin, û li otomobîlê siwar bûn û her yek veg-erî mala xwe.

Êvar bû û Ciwane li benda hatina bavê xwe ye. Dema demjimêr bû 7 deriyê malê vebû û Ciwane berve bavê xwe çû û got: “Bavo..min piroz bike, îro min bawernama xwe girt di asteke serkeftî de”

Bavik berve keçê xwe çû, himbêz kir û got: “Hezar carî piroz be delala min û ev nûçeya herî mezin û hêja di jiyana min de ye”

Ji paş ve dayika Ciwane bang kir û got: “Dê ka werin, em xwerina xwe bixwin, pişt re emê şahiya xwe dîsa berdeyam bikin”

Roj derbas bûn û mêhvanê Ciwane tîn û diçin ji bo piroz kirinê, û yek ji wan mêhvanan dayika Mihemed bû. Dema êvarê dayik û bavê Ciwane bi hev re rûniştin û dayikê got: “Bavê Elend ezê gotinekê ji te re bêjim lê naxwazim tu aciz bibî”

Bavik got: “Kerem bike xanima min” Dayik: “Îro dayika Mihemed hat û Ciwane piroz kir û dîsa pirsê zewaca lawê xwe û keçê te bi min re vekir ezê çî bersivê bidim jinikê?”

Bavik sor bû û bi hêrs got: “Keçik ji bo zewacê ba min tune ne”

Dayik: “Bavê Elend aciz nebe, aram

be, û baş guh bide min”

Bavik hinde dinê bi hêrs bû, û got: “Ez keçê xwe nadim wan”

Dayikê got: “Tu baş zanî herdû ji hev hez dikin ev bû pênc sal”

Bavik rabû ser xwe û bi dengê bilind got: “Ez keçê xwe nadim xortekî Erebb”

Di vê demê de Ciwane dengê bavê xwe bihîst û ji odeya xwe derket û got: “Bavo tu çima ne razî?”

Di wê hêrsbûnê de bavik li paş xwe nêrî û jê re got: “Ji ber ku Erebb e”

Ciwane: “Bavo ne te got dema tu zanîngehê bi dawî bikî emê binêrin ku emê çî bikin”

Bavik: “Erê min jibîr nekiriye, lê min ne gotibû ez razî me”

Ciwane matmayî ma û bavê wê gotina xwe berdeyamkir û got: “Ma xortên Kurdan neman heta te bidme kurekî Erebb?”

Ciwane nema dizane çî bêje li hem-ber serhişkiya bavê xwe, wê jî bi hêrs got: “Bavo ez ji Mihemed hez dikim û ev heyama 5 salan e û em herdû jî hev dixwazin”

Bavik sor bû û got: “Ma zarokên te çî derkevin Erebb yan kurd?”

Tuyê bi çî zimanî bi zarokên xwe re biaxivî?

Çima tu bersiva min nadî?”

Ciwane bê bersiv ma li hember pirsên bavê xwe lê çavên wê tijî hêstir bûn û got: “Bavo ji bo xwedê, razî bibe ma çî guneha me ye ku ez kurd im û ew jî Erebb hatiye dinyayê”

Bavik hinekî bê deng ma û Ciwane ket odeya xwe.

Di wê şevê de xew neket çavên kesî heta berbanga sibê.

Piştî xwarina taştê bavê Ciwane jê re got: “Binêre ez nerazî me ji vê zewacê lê dîsa ez nakevim ber gunehê te û here bi Mihemed re zewacê bike”

Di vê demê de rûyê Ciwane hinekî vebû, li şahiya wê berdeyam nebû dema bihîst bavê wê dibêje: “Ciwane rojek werê tuyê poşmam bibî û dema destê wî bi te bû, tu êdî keçê min ninî” û rabû ket odeya xwe û hêstir bi çavên Ciwane û dayika wê ketin.

Piştî heftekê Ciwane cilên spî li xwe kir û rûyê wê wek ferîştîyek bihuştê bû, û xelik kombûn û dengê mûzîkê û çepikan bilind dibe

Ciwane bi kirasê bûkanê ket odeya bavê xwe ji bo xatirexwestine, lê bavê wê got: “Derkeve ji mala min”

Ciwane bi dilekî şikestî û çavên bi hê-sir bi zavayê xwe re ji mala bavê xwe derket.



Piştî dawetê, Ciwane pir kêfxweş bû û tevî xesûya xwe runişt. Rojekê ji rojan dayika wê çû seredana wê.

Ciwane pir kêfxweş bû bi dîtina dayika xwe. Herdu bi hev re rûniştin û bi şahî diaxivîn. Ji nişkê ve xesûyê wê ket odê û runişt û got: “Hûn çima bi Erebb naaxivin, bila em jî ji we fêr bikin û bi hev re bikenin”

Di vir de Ciwane û dayika xwe nema dizanin çî bersiv bidin.

Piştî mehekê, Mihemed bi Ciwane re runişt û got: “Were ez dixwazim çend şîretan bi te re bikim”

Ciwane: “Kerem bike”

Mihemed: “Binêre Ciwane niha tu bûy hevîna min û divê tu wekî me rabê û rûnê”

Ciwane: “Çawa yanê?”

Mihemed: “Destpekê divê cilên te yên derveyî malê fireh û dirêj bin û nabe tu bi tena serê xwe derkevi, ya bi min re yan jî bi diya min re”

Ciwane got: “Te çima ev tişt berî zewacê bi min re negot?”

Mihemed: “Ciwane divê ev tişt tu ji xwe zanibî”

Roj bi roj Ciwane neçar ma û hat guhertin, lê dilê wê xemgîn dibû.

Piştî salekê, zarokê wê çêbû û pir kêfxweş bû û got: “Ezê navê lawê xwe bikim Ferhad”

Lê, xesûya wê nehêst û got: “Bavê lawê min Ebdulah e”

Ebdulah mezin bû û dest bi axaftinê kir, dema Ciwane xwest bi Kurdî bi-axive bi lawê xwe re, dîsa Mihemed ew agahdar kir û got: “Ciwane jibîr neke em Erebb in û divê tu bi Erebb bi lawê min re biaxivî”

Ciwane bi hêrs got: “Ma çî dibe eger ez lawê xwe fêrî zimanê xwe bikim”

Mihemed: “Ji ber ku ez dixwazim zimanê lawê min zelal û resen be”

Di vir de Ciwane şiyar bû û li xwe vege, û hemî gotinên bavê wê hatin bîra wê.

Roj derbas bûn û nema dizane çî bike, bimîne yan here.

Eger bimîne, nasnameya wê roj bi

roj wenda dibe û bin dest dibe, eger here ewê bi çî rû li bavê xwe binêre? Lê dîsa ji xwe re got ezê hewil bidim, bi Mihemed re got: “dixwazim lawê min ferî zimanê min bibe jî, ji ber ku dema te ez birime te zanibû ez kurd im”

Mihemed got: “Na eger tu naxwazî tu dikarî xwe bidî berdan”

Ciwane bi hêrs rabû, lawê xwa rakir û got: “Niha min berde”

Mihemed ber ve çû û lawik ji himbêza wê kişand, û got: “Tu jî jibîr neke dema te birime te zanibû ez Erebb im, û ev law ji min e, yanî ew jî Erebb e, ji ber vê yekê ewê bi min re bijî û niha jî here min tu berday”

Çavên Ciwane tijî hêstir bûn, hewil da berxê xwe ji dest bigre, lê hewil-danên wê bê encam bûn.

Mihemed bi destê wê girt û qewitan-din derveyî malê.

Ew pêxwas li kolanan meşî wekî dînan û dengê bavê wê di guhê wê dice û tê, dema jê re gotiye: “zarokên te çî derkevin Erebb yan Kurd?”

Û dengê Mihemed wek bersivê hat guhê wê dema got: “Ez Erebb im û ew jî lawê min e, yanî ew jî Erebb e”

Derî li pêş çavên Ciwane hatin girtin, lê berê xwe da mala bavê xwe li derî xist bavê wê vekir.

xwe avêt himbêza wî û hêstir wek baranê diherikin, û got: “Bavo min biborîne ez poşman bûm e”

Bavê wê destê xwe di ser porê keçê xwe re bir, û got: “Aram be keçê min, ez herdem li piştê te me, serê xwe rake û li min binêre”

Ciwane serê xwe rakir, û li cavên bavê xwe nêrî.

Bavê wê got: “Keçê min! bawer bike çiqas sal û dem derbas bibin, dijmîn e.”

Çiqas mar çermê xwe biguherîne, ew her tim dimîne mar û her tim dimîne dijmîn.

Û piştrast be keçê min

(DIJMINÊN BAV Û KALA NABIN DOSTÊ LAWAN)

Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

Du birayên Yarsanî dîsan hatine binçavkirin

Du birayên Yarsanî ku li girtîgeha vekirî ya rêjîmê de bûn, piştî zivîrîn bo girtîgeha rêjîmê li bajarkê Kirmaşanê, hatne binçavkirin û bo îdareya îtîlaat li wî bajarî, hatine veguhastin.

Pêka rapora Kurdpayê, du birayên Yarsanî yên bi navê “Pûrya û Şuca’î Minnetî Menciqtepe” yên xelkê bajarê “Sehnê” ser bi bajarê Kirmaşanê ku li girtîgeha vekirî ya rêjîmê ya bi navê “Çişmê Sifîd” a bajarê Kirmaşanê de bûn, piştî zivîrîn bo vê girtîgehê, hatine binçavkirin û bo îdareya îtîlaat a rêjîmê li wî bajarî hatine veguhastin.

Heta niha sedema dubare binçavkirina wan du birayên Yarsanî nehatiye zanîn.

Ew 2 birayên Yarsanî li heyva Xezelwera 1401 a Rojî de li rêûresma 21emîn salvegera canjîdestdana hunermendê Yarsanî “Xelîl Alîniyad” de hatibûne binçavkirin û piştî bi tuhmetên “alozkirina aramiya giştî û lêdan û kutanê” ji aliyê taya 2 a dadgeha cezakirin a rêjîmê li bajarê Kirmaşanê de salek girtîgeh û lêdana 74 derbên qamçiyên bi ser wan de hatine sepandin.



Rêjîma Îranê li vê heftiyê de 7 girtî bidar vekirin


Li girtîgehên rêjîmê li bajarên “Meşhed û Tewrêz” ê de rêjîma Îranê 7 girtî bidar vekirin.

Pêka rapora Navenda Mafê Mirovê Îranê, rêjîma Îranê li demjimêrên sibêdeha roja Sêşemiyê de li girtîgeha navendî ya rêjîma Îranê li bajarê Tewrêzê de 3 girtî bi navên “Riza Ehmedzade, Behram Muherremî û Mensûr ku nasnavê wî nehatiye zanîn”, bidarvekirine.

Herwisa pêka vê raporê, sibêdeha roja Yekşemî 10ê Pûşperê, 4 girtî li girtîgeha “Wekîlabad” a rêjîmê li bajarê Meşhedê de bidarvekirine ku 2 ji wan xelkê bajarê Meşhedê û yek xelkê bajarê Qûçanê û yek jî xelkê welatê Efxanistanê bûye.

Bidarvekirina wan girtiyan bê agehdarbûna malbatên wan hatine kirin û nasnameya wan bidarvekiyan heta niha nehatiye zanîn.

Ew bidarvekirinane li halekê de bi rê ve çone û rêjîma Îranê bi lahiyan daxwazê ji xelkê Îranê dikan ku li şanoya hîlbijartina serkomariyê de beşdariyê bikin û deng bidne rêjîmekê ku bi berdwamî xelkê Îranê bi hêcet û tohmetên cuda, bidar diveke an li jêr îşkenceyan de dikuje.



Dadgeha taybet a Olî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê, 2 mamostayên olî banghêjkin

2 mamostayên Olî yên xelkê bajarê Serdeştê ku li tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de piştevanî li xelkê Kirbûn, ji aliyê dadgeha taybet a olî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê, hatine banghêjkin.

Pêka rapora Ajansa “Kurdpa”yê, mamosta Dr. “Selam Mehmûdiyan” ê pêşnimêjê gundê “Bêwuran a xwarê” û mamosta “Hesen Xizrî” yê pêşnimêjê gundê “Bêwuran a serî” ser bi bajarê Serdeştê, ku li pêwendî digel piştevaniya wan ji tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê, rastî dosyesaziya ewlehî hatine, bo dadgeha taybet a olî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê hatine banghêjkin.

Ew 2 mamostayên olî li pêvajoya serhildana 1401 a Rojî de û bi sedema piştevanîkirina wan li xelkê, neraziyan, birîndaran û malbatên şehîdan, çendîn caran bo navendên ewlehî yên rêjîmê li bajarê Serdeştê hatibûne banghêjkin û piştî gefxwarin û givaşxistina navendên ewlehî, rastî dosyesaziya ewlehî-dadwerî li dadgeha taybet a olî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê de hatine.

Ew 2 mamostayên olî bi pêka belgeya banghêjiyê, divê roja Çarşemî 13ê Pûşperê li dadgeha taybet a olî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê de amade bibin.

Herwisa wan 2 mamostayan, heta niha çendîn caran nerizayetiya xwe li hember kuştina kolberan li Kurdistanê, dane xuya.





Deng Bi Rengê Mirinê

Encama Hilbijartina Dagîrker



Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê
Navenda Ragihandinê